VEBÎNE Bêhempa KEVN

# WÎLAYETA KALMARÊ



# Rêbera min a gerrê

Nav: ..................................................

Temen: ..................................................

Ez pê re digerim: ..................................................

..................................................

Ez dixwazim herim serdana: ..................................................

..................................................

..................................................

..................................................

..................................................

..................................................

..................................................

..................................................

..................................................

Wêne ji alî min ve hat çêkirin

Bizavên min ên bijare yên havînê: ..................................................

..................................................

..................................................

..................................................

..................................................

# KEVIR, DARISTAN Û AV!

**Coxrafiya Småland û Öland ne wek Swêdê ye. Kevir, daristan û av lê zêde ye.**

Hûn bi xêr hatin herêma heyecandêr ya talûtêr a Swêdê ya gelek tiştên dîtinê û kirinê lê hene. Daristanên tarî yên golên biefsûn li wan hene. Dîmenên vekirî tevlî mesîlên dirêj. Dîwarên dirêj yên kevirî û xanîkên şêrîn yên sor. Kelehên ji mêj ve û bermayîyên kevnar.

Mirov, bi hezarên salan li vê derê jîyane. Ji bo hûn rêçên wan li dû xwe hiştine bibînin, çavên xwe baş vekin. Ev rêber ji bo tiştên dîtinê û kirinê bêtirî 100 fikran dide we.

## TÊDEYÎ:


| | |
|---|---|
| Li Småland û li Ölandê xwarin | 4 |
| Geşt | 6 |
| Mirovên efsûnkar | 8 |
| Azmûn | 10 |
| Mirov berê çawa jîyane | 12 |
| Xerîte | 14 |
| Li ser xerîteyê cîh | 16 |
| Azmûn | 17 |
| Kar û pîşe | 18 |
| Birêveçûnên jîngehê û papûr | 20 |
| Li her derî kevir | 22 |
| Kelek û deryagerî | 24 |
| Quiz | 26 |




# XWANDINA LI SMÅLAND Û ÖLANDÊ

Li Wîlayeta Kalmarê, we navê hûn ji bo peyderkirina xwarinê bi dûr bikevin. Herêm, jêdera çendîn xwarinan e. Li wê cotgeh û komgehên masîvanîyê hene. Hûn dê çêlekan, berxan û tûtikan/mirîşkan bibînin. Zevîyên fireh ji bo berhemanîna kartolan/patatan, zadî û zerzewatan yekbiyek in. Dema havînê dema berhevkirina çîlekan e û daristan payîzê bi karok/kumikan/kivarikan û dendûreşkan/dirîmokan tije ye.

Xwarina we ya bijare kîjan e?

.............................................................



### Masîpehnika Kalmarê

Masîpehnik di seranserê beravê de tê girtin. Gava ew di binê deryayê de xwe vedişêre reng diguherîne û hêdî xuya nake.




### Çîlek

Mêweyê herî çêjxweş yê ta vê gavê ye, nexasme ku hûn bi xwe wan biçinin / berhev bikin.



Ji bo kirrîna masîyekî demildest herin sekûyeka masîvanîyê. Yan jî ji bo kirrîna zerzewatên nûberhevkirî herin serdana dikaneke zevîgehê.

### SEKÛYÊN MASÎVANÎYÊ

Seranserê beravê bi sekûyên masîvanîyê xemilandî ye. Zemanekî li Deryaya Baltik bi sedan kelekên masîvanîyê hebûn, lê di vê demê de bi tenê çend ji wan hene. Heger hûn bikarin masîpehnik, turbot yan masiyê rînga bikirin wê rojê bextê we vikiriye/hon bi şans in.

### *DIKANA LI BÊNDERÊ


Li Wîlayeta Kalmarê gelek dikanên bixwedî/bêxwedî li ber gov û zevîyan hene. Hindek ji wan pincar, goşt, gul û çîçek, hingivî yan jî tiştên dî ku wan bixwe çandine- amade kirine difiroşin. Carnan pêwist e mirov peran bixwe sindoqeka li dikanê. Hindek dikanên - EKO-ringar - çerxa safî (dikanên tiştên wan bi xwe amade kirine/çêkirine û ekolojîk in difiroşin) hene. Mirov dikare li van dikanan berhemên herêmî bikire.

### Kekê bipenêr Ostkaka

Şîranîya herî çêjxweş ya dinyayê. Ostkaka, bêtirî 500 salan e heye.

### Karok/kumik /kivark/kivyark

Di havînê de karokên çenterel gihiştine û mirov dikare berhev bike. Gava di nav nîvîşkî de tên qelandin dibin sos yan malzemeyekê sandiwîçan yê tamxweş. Karoka çanterel zêrê xas e, ji ber vê yekê tu caran cihê karokên xwe nîşanî tu kesî nekin.



### Bestenî/berfeşîr


Li beravê tu rojek bêyî besteniyê/berfeşîrê nayê temamkirin. Çîniyan berî hezarê salan ji berfê û mêwe bestenî/berfeşîr çêkirine. Li Swêdê Cajsa Varg di sedsala 18an de reçeteyek li ser besteniyê/berfeşîrê nivîsî.


### Kerevîd

Kemîn êvaran tên danîn û sipêdeyan tên hilanîn. Sebebê vê, şevê bizava kerevîdan e. Şahîya kerevîdê li Swêdê 'adeteke payîzê ye.

### Isterband

Sincoqek bi dû pijandî ya Smålandê ye ku tê de kartol/patat û ceh heye. Di zemanê berê de ji bo ziwakirinê dihat daleqandin. Bi kartolan/patatan û sosa dêjnikê pirr çêjxweş e.






### Hingiv

Mêşên hingivî bivênevê ne û maneya mêşên hingivî hingiv e.
Ji bo tijekirina qavanozeke hingivî 20.000 mêşên hingivî divên.

### Tûşembî û pêşik

Destûra we heye ku hûn dendûreşkan/dirîmokan ji daristanê berhev bikin. Pêşik di Temûz û Tebaxê de digihîjin. Tûşembî hindek derengtir.




### Kutlik; Kutilkên kartolan/petatan

"Kroppkakor" xwarina herêma Ölandê ye. Ew li Smålandê sipî ne û li Ölandê gewr in. Gelek caran bi pîvazê, goştê berêz û îsota Jamaîkayê tê dagirtin.

### Somon


Somon, ji deryayê ber bi cihekî, çemekî ku hêkên xwe danînê ve koç dikin. Masîgirtina somonan kêfeke navdar e. Xeyalê me hemûyan girtina masîyek somon yê 20 kîloyî ye.

# GEŞTÊN DERYAYÎ

Hûn ji geştên deryayî hez dikin? Aha li vê derê çend tiştên hûn dikarin bibînin û bikin hene. Geşta we xweş be.

Hûn dixwazin li kîjan herêmê bigerin?

.......................................................



**Smalspåret** 1

Rêkurteka hêsinî ya di navbera Västervik û Hulsfredê de ye. Ji 1950yê ve mirov dikare bi otobusa rêhesinî here û were. Ev otobusa rêhesinî li 20 îstasyonan disekine û dikare li gelek cihên balkêş jî raweste. Tu dikarî bi Dressin di navbera Hulsfred û Målila de geştê bikî. Dressin bisiklêtek hêsiniye ku mirov li ser rêya hêsinî dajo.

**Mîrasa Cîhanê ya Başûrê Ölandê** 6

Bigerin û bibin heyranên gundên rêz bi rêz, zevîyên çandiniyê, mêrgên beravê û Alvara Mezin. Ew bi hev re, bi destê mirovan û ajelan mîraseke cîhanê ava dikin.

**Pira Ölandê** 7

Pire 6.072 mîtro dirêj e û gava ew hatiye avakirin, ya herî dirêj ya Ewropayê bûye. Cih wê yê herî bilind 42 metro ne û bilindahiya wî wek fanosa deryayî ya herî bilind, Långe Jan (Canê Bejindirêj) yê Swêdê ye. Hûn ji serê girî dämenê Ölandê û Tengava Kalmarê yên bêhempa dibihîsin.

**Ferîbota bisiklêtan a Kalmar-Färjestadenê** 2

Li ser pirê re ajotina bisiklêtan qedexe ye, lê hon dikarin bi bisiklêtê xwe li ferîbota Kalamar - Ölandê siwar bibin. Piştî we çend seetan bisiklêt ajot hon ji bo vegerê amade ne.



**Safarîya fokan** 3

Kelek ji Bergkvarayê radibe û li seranserê beravê digere. Hûn dê di piranîya geştan de bibînin ku fok di avê de dileyîzin yan li ser latan/zinaran xwe li ber rojê germ dikin. Dibe hûn eyloyeke qemçsipî jî bibînin.

**Kelekên komgiravan** 4

Hon dikarin bi keleka havînê ji Västervik herin Idö û Hasselö.

**Keleka ji bo fanosa deryayê ya Garpenê** 5

Keleka Garpenê ji Bergkvarayê radibe. Zembîla seyranê û cilê berava avjenîyê wergire.

8

**Keleka ber bi girava Blå Jungfrunê ve**

Hûn dikarin li "Blå Jungfrun"ê bigerin, serê xwe bişon û herin serdana şikeftan. Û labîrenteke kevirî jî heye lê ji kerema xwe keviran li "girava pîrelkê" bihêlin.

**MA WE PÊ ZANIBÛ...**
Blå Jungfrun herweha wek Blåkulla jî tê naskirin?

## MUZEXANEYÊN KÊFKIRINÊ JI BO SERDANÊ

**Himmelsberga** 9
Li gundê kevnar ê Ölandê muzexaneyek. Di havînê de li vê derê ajel hene û hûn dikarin di karên hêsan ên destî de, bizavan de û leyîstikan de hostayîya xwe biceribînin.

**Muzexaneya Hunerê ya Kalmarê** 10
Di hindek yekşeman de ji bo zarokan û dêûbavan keysa çêkirina hunera xwe bixwe heye.

**Muzexaneya Pîsta Pêşbazîyê Målilla** 11
Ji bo hemû hezkirîyên pîsta pêşbazîyê cîhê hatinê.

**Li Kalmarê Muzexaneya Tjorven** 12
Tjorven di salên 1970yî de navgîneke piçûk bû ku ji alî postexaneyê ve bi kar dihat.

**Li Hjortedê Muzexaneya Moped** 13
Koleksîyona mopedên kevn yên ji 1950yî pê de.

**Muzexaneya Wilayeta Kalmarê** 14
Topên ji keştîya qiralîyê ya li nêzîkê Ölandê di 1676an de noqbûyî û eserên din tên nîşandayîn.

**Muzexaneya Västervik** 15
Pêşangehên herêmî yên deryagerîyê û tarîxa Västervikê. Ji bilî van keleheke çavdêrîyê û hindek mêrg û çîmenên ciwan jî hene.

**Muzexaneya mobilyan** 16
Virserum zemanekî navenda berhemanîna mobîlyayê bû. Muzexane awayê çêkirina mobîlyayan nîşan dide.

**Galerîya Hunerî ya Virserumê** 17
Eywaneke mezin a tê de çendîn pêşangeh hene.

**Muzexaneya Skeddemose** 18
Mozexane behsa ka çawa Birgerê 11 salî di 1959ê de xezîneya 1.3 kîlo zêr dîtiye dike.

**Muzexaneya fîrînê li Lindås** 19
Li vêderê pumpeya binavî ya valekirina ava keştîyan ku di sala 1947ê de hatiye çêkirin heye. Tu dikarî formê şûşeya Coca Cola ya ewil jî li vêderê bibînî.

**Muzexaneya Madesjö ya Tarîxa Herêmî** 20
Axurên kevn ên dêrîn ên li Madesjö kyrkby-yê yek ji muzexaneyên Ji vê hevokê tiştekê fêm nakim.

# MIROVÊN EFSÛNDÊR

Småland û Öland bi salan cîhên xwedêdana gelek mirovên balkêş bûne. Hindek navdar û hindek jî ne pirr navdar. Ji bo bêtir hînbûna li ser jîyana wan herin serdana cîhên cûrbicûr.

Hûn pûanê herî bilind didin kî?

..........................................................

## Nils Dacke 1



Xwedê Nils Dacke-yî li Södra Lindön, Emmabodayê daye. Li dijî Gustav Vasayî pêşkêşîya serîhildana Dackefejden kiriye. Li Kanabergê nêzîkî Fårydê şikeftek heye ku xwe tê de veşartiye. Dacke di cengeke nêzîkî Virserumê de birîndar bûye û xwe di şikefteke din de veşartiye. Dacke di 1543yan de bi destê leşkerên qiralî hatiye kuştin. Heykelê wî li Virserumê ye.

## Astrid Lindgren 2



Astrid Lindgren yek ji nivîskarên herî navdar û hezkirî ya Swêdê ye. Ew li gova Näs mezin bû ye. Wê li vê derê lahistî ye û gelek çîrokên wê ji vê derê tên. Li Astrid Lindgren tu dikarî Pippi û gelek kesên dî ji kitêbên hezkirî yên wê nivîsî bibînî.



**MA TE DIZANÎ?**
Döderhultarn tu caran ji mala diya xwe bar nekir û hertim galoş dikir pê. Di mal de û derve galoş li piyan bû.

## Döderhultarn 3

Döderhultarn hunermendek bû ko ajel û mirov li ser darî neqiş dikir. Wî heykelên xwe gelek erzan difirot. Paşê navdar bû û îro fîgûrên wî gelek biha ne. Tu dikarî fîgûrên wî bibînî û biçî serdana atelyeya wî li Oskarshamn.

## Emila Lönnebergayê 4

Lönneberga navdar e, ji ber ku Emil lê jîyaye. Li gundî jorek heye ku tê de heykeleke Emîlê heye. Dibe keysa we hebe hûn hindek netebitîbûnê bikin.

## 5 Alla vi barn i Bullerbyn (Zarokên Gundê Bixirecir)

Navê rast ê Bullerbynê Sevedstorp e. Cihê ku di 1986ê de fîlim lê dihatin kişandin ev der e. Gelek ji zarokên xwandingehê û gundîyan di filmî de cih girtine. Bavê Astrid Lindgrenê li Mellangårdenê mezin bûye.

## KESÊN DIN ÊN BALKÊŞ ÊN WÎLAYETA KALMARÊ:

**◆ Gustav-Jon 6**
Gustav hunermendek bû ku ji meselokên încîlê û ji tarîxê îlham disitand û heykelên darî çê dikirin. Karê wî li Segerstadê çêdikir, Muzexaneya J.A.G.S. tê nîşandayîn.

**◆ Per Ekström 7**
Per, wênesazeke bi dîmenên avabûna rojê navdar bû. Kesî nikaribû wêneyê rojê wek Perî çê bike. Heykelê wî li Mörbylångayê ye.

**◆ Arvid Källström 8**
Arvid Källströmê heykelsaz di malbateke cotgehê ya Påskallavikê de 30 sal jîyan û kar kir. Gelek ji heykelên wî li baxçeyî tên nîşandayîn.

**◆ Varg-Kalle 9**
Varg-Kalle yek ji nêçîrvanên guran ên Swêdî yên bihuner ên sedsala 19an bû. Kêlika tirba wî li Bäckeboyê ye.

**◆ Maja li Palace Hotelê 10**
Maja, otêla li Hultsfredê ya gelek komên muzîka rock lê diman dixebitand. Li ser The Walkê li ser Zêwa Hultsfred zanyarîya bêtir bi dest bixin.

**◆ Glass artists 11**
Erik Höglund, Bertil Vallien û Ulrica Hydman Vallien sê hunermendên herî navdar ên Kingdom of Crystal (Qiralîya şûşeyî) ne. Hanna Hansdotter, Åsa Jungnelius û gelek ên din ev tradisyon zindî hiştin.


**◆ Carl Malmsten 12**
Carl, arastekarekî mobîlyeyan ê bi nav û deng bû. Wî li Vickeby dest bi xwendingeha mobîlyeyan ya bi navê Capellagården kir.



## Bêmal 13

Di zemanekî ne pirr berê de li Smålandê gelek mirovên bê mal ên derbider dibûn hebûn. Ta zarok jî di seranserê rojê de ji bo peyderkirina xwarinê û cîhê mayînê li kolanan digerîyan. Hönsalottasa li Bodayê muzexaneya herî mezin a bêmalan a Swêdê ye. Meseloka zarokên bêmal nikare bê jibîrkirin. Dê li Storegårdena Tigerstadê şansê we yê jîyana serpêhatîya wek yekî bêmal hebe.

## Vilhelm Moberg 14



Vilhelm Moberg yek ji nivîskarên herî navdar yê Swêdê ye. Wî li ser mişextiyên (mihacirên) Karl-Oskar û Kristina nivîsiye. Soldattorpeta ku ew lê mezin bû ye ne maye. Lê li vêderê kevirê bîranîna wî Mobergstenen heye. Tu dikarî biçî serdana mûzexaneya li dibistana wî li Moshultamålayê. Peya yan jî bi bisiklêt bikeve ser dirba mişextiyan û li îstasyoan trên ya li Emmaboda mêze bike bisiklêtî wî.

## Jenny Nyström 15



Jenny Nyströma hunermend û raveker li Kalmarê ji dayîk bûye. Ew herî pirr bi kardên Noelê yên pizik di wan de hene, navdar e. Gelek ji wêneyên wê li Muzexaneya Bajarokê bajarê Kalmarê tên nîşandayîn.


DEMA AZMÛNÊ
Nils Dacke di wêneyî de xwe veşartiye. Gelo tu wî dibînî?
Segav û Bilbil serî li fanosa deryayê xistin, vêga rêya vegera kempê nabînin! Gelo hûn dikarin alî wan bikin? Binihêrin! Pê li mêşên hingivî nekin.
Bibîne û bixe nava giloverê:
• 8 berazên hov
• 5 pezkûvî
• 6 mamiz/bizinkûvî
Ah, na!
Qevenoza hingivî şikestî ye! Gelo tu dikarî perçeyên kêm bidî ber hev?
A.
B.
C.
D.
ê/a hêja!
ê/a te.
Ji hinekan re kardê posteyê binivîsine û ji wan re behsa gerra xwe bike.
Lîtreyek 15 kron
Hûn ê bi 50 kronan çend lître çîlek bi dest bixin? ........................
Di resmî de çend mêşên hingivî hene? ...............
Li vê derê hindek peyvên herêmî hene.
Grina
Grunna
Krösamos
Redig
Tabberas
Tjabba
Tyken
Bi ramana te mebesta wan çi ye?
Ji bo hûn çar besteniyên/berfeşîrên ji hev cuda daynin rêza Jêrîn û Hember, çarberkan dagirin.
10 bilbilîtankan/pelîtankan/perperokan bibîne û wan bixe nava giloverê:
Heft cudayiyên di nava besteniyên/berfeşîrên milê rastê de ne, bixe nêv giloverê.
FERHENGA SWALANDÊ
Grina = Laugh
Grunna = Ponder
Krösamos = Doşava gilyaza Swêdî
Redig = Rast/Rewa
Tabberas = Şahîya ku mêvan li ser maseyê çi hebin hemûyan bixwin biqedînin
Tjabba = Biaxife (gevezetî)
Tyken = Kesê cirnexweş û ji nava xwe qayîl
Di kîjan nîkê de nêçîr heye? ...............
A.
B.
C.
Bêyî rakirina qelemê bidin dû xêza bi nuqit.

# MIROV ZEMANEKÎ ÇAWA JÎYAN

Ji mirovan re ji bo jîyanê her tim cîhek lazim bû. Serîlêdana xanîyên kevnar, dê li ser awayê jiyana berê ya mirovan dê we fêrî pir tiştan bike.

Hûn herî pir dixwazin li ku derê bijîn?

..............................................................

## Besväret û Fnyket 1

Du herêmên qeseba, yên herî kevn ên Oskarshamnê tevlî xanîyên kevn û kolanên teng. Hûn ê li jêra sekûyê, Långa Soffan-a ku yek ji bankên parkan ên herî dirêj ên dinyayê ye bibînin.

## Penåsa ödeby 2

Li navenda Alvara Mezin gundekî di 1844an de hatiye terkkirin heye. Hûn dikarin bermayîyên sitargehekê û mexzeneke kevirî bibînin.

## Stensjö by 3

Tarîxa vî gundê gencparastî yê nêzîkê Oskarshamnê diçe sedsala 18an û 19an. Rêyên wê yên teng ên bi mesîl û sitûnên wê yên gilover hene.

## Duvemåla 4

Rundqvistagården li Duvemålayê cotgeheke kevn e ku zeman lê rawestîyaye. Tableyeke ku sîmîtên Mobergî pêşkêş dike û qehwexaneyeke wî ya bikêf heye.

## Qvarnaslät 5

Parkeke delal a li dilê Nybroyê, tevlî avahîyên sedsalan kevn û cûrbicûrê muzexaneyên xwe hene.

## Krusenstiernska garden (Baxçeyê Krusenstiernska) 6

Krusenstiernska cotgeheke kevn û baxçeyin li navenda Kalmarê ne ku hema hema wekî berî sed salan xuya ye. Tiştekê jê fêm nakim.

## Fallebo gård 7

Li nêzî Oskarshamnê cotgeheke kevnî î ku gelek ajel tê de hene heye. Li herêmê ji bilî van hindek papûrên şahane hene.

## Wimmerströmska gården 8

Li Storgatan-a Västervikê milkekî xweşik ya ji sedsala 18an mayî vêga wek muzexaneyeke tarîxê ya tê de 6.000 tişt hene, xizmetê dike.



## Fredriksbergs herrgård 9

Koşk û raxistinên ji sedsala 18an. Her tişt hatiye parastin, tevlî veşarîbûna kevn.

## Rosendal û Sküftekärr 10

Gundekî Serdema Hesinî li Rosendala bakurê Ölandê bi bingehan û mezelan. Li Sküftekärrê ji nû ve avakirineke otantîk a cotgeheke Çaxê Hesinî heye.

## Stenriketa li gundê Djursdala 11

Sven Petter Persson tevahîya jîyana xwe di ber paqijkirin û çandinîya axê de derbas kir. Qiralîya wî ya "Keviran" li nêzîkî Vimmerby-yê ji bo cehda Smålandersê abîdeyek e.


## Båtastan 12

Båtastana li Gunnarstorpê ji bo awayê jîyana cotkarên berê nimûneyeke baş e.

## Eriksgården 13

Ew li cotgeha Eriksgårdena nêzî Vimmerby-yê hespên karpêdanê wekî rojên berê bi kar tînin. Ew di nav xirecira din de gîyayî didirûn û rayan tirmix dikin.

Hûn dikarin li Katthultê biçin xanîkê alavan ê Emil û neqşên wê yên kolandî bibînin.





Îkramên dewlemend hene.

## Olssonska gården 14

Ji bo rêwîtîyeke ber bi dema berê ve serî li Torsåsê serî li Olssonska gårdenê bixin. Serpêhatîyeke seransere temenekî.

## Stenhuggarkojan 15

Şikefteke li Björköya komgiravên Västervikê Hostayeke keviran di destpêka sedsala 20î de lê jîyaye.

## Klasatorpet Koşka leşkeran 16

Li nêzî Emmabodaya ku fîlmê Vilhelm Moberg Emigrants lê hat kişandin. Navê xanîyî di fîlmê de Korpamoen bû.

## Katthult 17

Cîhê ku fîlmê Emil lê hatiye çêkirin kişandin. Eger we ew dîtibin wê gave hûn dê çendîn avahîyan nas bikin.


## Bötterum 18

Muzexaneya herêmî ya tarîxê tevlî deh jorên wek awayê kevnar raxistî. Di pêşangehê de kemînek jî heye ku ew zemanekî ji bo girtina guran hatiye kar anîn.









# XERÎTE


Li vê derê nexşeyeke li ser cîhên di vê Rêberê de ne heye. Ji bo çêtir naskirina cîhên hûn diçin serdana wan, rûpelê bizivirînin rûpelî wergerînin.
EMMABODA
NYBRO
TORSÅS
KALMAR
MÖRBYLÅNGA
BORGHOLM
MÖNSTERÅS
HÖGSBY
HULTSFRED
VIMMERBY
VÄSTERVIK
OSKARSHAMN
Emån
TÊBÎNÎYEK: Gazî kanoyekê bike û here paddlinge-ê.
Blå Jungfrun
V
Ö
S
N
Hûn dikarin li vê derê şûna cîhan di ser re bibînin. Ji bo hînbûna bêtirî van, onlayn bigerin yan bi nivîsîngeheke geştê bişêwirin.
Di rêberê de rengê her rûpelekê bixwe heye û ji bo her deverekî jimarek heye. Ji bo di xerîteyê de dîtina cîhan, rêya herî baş ev e.
RENG:
Geşt
Mirovên balkêş
Mirov zemanekî çawa jîyan
Kar û pîşe
Sirişt û papûrên birêveçûnê
Her der kevir
Kelek û deryagerî

# CÎHÊN LI SER XERÎTEYÊ

## Öland
Kelekê gilover bikin 2
Mîrasa Cîhanê ya Başûrê Ölandê 6
Pira Ölandê 7
Himmelsberga 9
Muzexaneya Skedemosse-ê 18
Muzexaneya J.A.G.S. 6
Heykelê Per Ekström 7
Capellagården 12
Penåsa ödeby 2
Rosendal û Skäftekärr 10
Bergstigen û Södra Bruket 5
Albrunna quarry 5
Prästgropen Dröstorp 3
Beijershamn 8
Gola Möckelmossen 15
Dîwarê Mittmuren 2
Kevirê rûnîk ê Karlevîyê 3
Keleha Borgholm 10
Sûra Eketorp 11
Sûra Gråborg 12
Fanosa deryayê ya Långe Jan (Conê Bejndirêj) 1
Sekûya masîvanîyê Bläsinge 4

## Kalmar
Muzexaneya Hûnerê ya Kalmarê 10
Muzexaneya Tjorvenê 12
Muzexaneya Wîlayeta Kalmarê 14
Şikeftên li Kanabergê 1
Wêneyên Jenny Nyströmê 15
Krusenstiernska Gården (Baxçeyê Krusenstiernska) 6
Keleha Kalmarê 13
Dîwarê xelek ê Kvarnholmenê 1
Goristana kevn 5
Li Revsuddenê sekûya kevn 2
Qeyîqxaneya Ekenäsê 5
Keştîya şerî Kronan 7

## Torsås
Safarîya fokan 3
Keleka ber bi Garpenê ve 5
Şikeftên li Kanabergê 1
Båtastan li Gunnarstorpê 12
Olssonska gården 14
Gundên Vippstenen & Hallasjö-yê 2
Rezerva siriştî Örarevet 4
Ödet 19
Li Brömsebroyê abîdeya aştîyê 6
Daristana Brömsehusê 14
Muzexaneya Deryagerîyê 6
Fanosa Deryayê Garpen 8

## Nybro
Kêlika tirba Varg-Kalleyî 9
Qiralîya Şûşe 11
Muzexaneya Tarîxa Zindî Qvarnaslät 5
Destkariya Şûşeyî Orranäs 2
Karên Şûşeyî Målerås 8
Baxa Siriştî Hornsö 7
Labîrentên kevirî li Gullaskruvê 10
Rezerva siriştî Svartbäcksmåla 12
Muzexaneya Tarîxa Herêmî Madesjö 20

## Emmaboda
Muzexaneya Flygt 19
Södra Lindön 1
Glasriket (Dewleta şûşe çêkirinê) 11
Muzexaneya Rebenîyê ya Hönsalottayê 13
Xwandingeha Moshultamåla 14
Kevirê bîranîna Vilhelm Mobergî 14
Bisiklêta Vilhelm Mobergî 14
Duvemåla 4

Muzexaneya Tarîxa Herêmî Klasatorpet 16
Fabrîqeya Şûşeyan a Bodayê 3
Dîstîlasyona Kyrkeby-yê 6
Papûra Bîelkeleden 20

## Mönsterås
Xerabeyên dêran ên li Kronobäckê 17

## Oskarshamn
Keleka ji girava Blå Jungfrunê 8
Muzexaneya Döderhultarn 3
Källströmsgården 8
Besväret û Fnyket 1
Banka parka Långa Soffan 1
Stensjö by 3
Fallebo gård 7
Koşka Fredrîksbergî 9
Bråbygden 22
Li Hägerumê girên birçîbûnê 15
Kara keviran ya Vånevik 19

## Högsby
Bötterum 18
Rezerva siriştî More Kastell 6
Parka siriştî Hornsö 7
Rezerva siriştî Aboda Klint 9
Papûra Jonas Stolts kyrkvägî 18
Abîdeya birçîbûnê ya li Fagerhultê 8
Latên Kyrkstenarna 16

## Hultsfred
Smalspåret rêya hesinî ya tor-kin 1
Muzexaneya rêya lezê Målilla 11
Muzexaneya Mobîlyan 16
Pêşangeha Hunerî Virserum 17
Şikefta Dackegrottan 1
Heykelê Nils Dackeyî 1
Lönneberga 4
Palace Hotel û The Walk 10
Li Tigerstadê Storegården 13

## Vimmerby
Navenda kulturî Näs a Astrid Lindgrenê 2
Cîhana Astrid Lindgrenê 2
Bullerbyn 5
Stenriket li Djursdalayê 11
Eriksgården 13
Katthult 17
Dara Mazî ya Kvillekenê 1
Sme-ån papûra siriştî 5
Tuna lövpark 13
Parka Neteweyî Norra Kvills 16
Latê Runkesten 21
Keştîya stranan 18

## Västervik
Smalspåret, rêya hesinî ya tor-kin 1
Kelekên komgiravan 4
Muzexaneya Moped 13
Muzexaneya Västervik 15
Muzexaneya Tarîxê Wimmerströmska 8
Şikefta hostayê kevirî 15
Kanzayên Gladhammar 7
Girê Garpedansberget 11
Latên daleqandî Hängesten 14
Örnberget û Fruberget 17
Kanzaya Stenebo 7
Xerabeyên Keleha Stegeholm 9
Keleha çavdêrîya pîlotî Idö 3
Noqa Mars Makalös 9
Sekûlek Holms 10

| RENG | ŞÛN | PEL |
|---|---|---|
| | Geşt 6 | |
| | Mirovên balkêş | 8 |
| | Mirov zemanekî çawa jîyan | 12 |
| | Kar û pîşe | 18 |
| | Sirişt û papûrên birêveçûnê | 20 |
| | Li her derî kevir | 22 |
| | Kelek û deryagerî | 24 |






## RAST YAN ŞAŞ?
R yan Ş-yê nîşan bike

Wêne ...ê xwe heye

| | | R | Ş |
|---|---|---|---|
| 1 | ... 14 kaj | ☐ | ☐ |
| 2 | ... Masîyên reş ji yên hêşîn bêtir in. | ☐ | ☐ |
| 3 | ... Ducarî wek gelek beraz û conega | ☐ | ☐ |
| 4 | ... 14 kumik/karok/kivarik | ☐ | ☐ |
| 5 | ... Çîlek tune ne | ☐ | ☐ |
| 6 | ... 3 berazên pembe | ☐ | ☐ |
| 7 | ... 8 tirimpêl | ☐ | ☐ |
| 8 | ... 1 tirimpêla zer | ☐ | ☐ |
| 9 | ... 2 mîhên reş | ☐ | ☐ |
| 10 | ... 1 lenger | ☐ | ☐ |
| 11 | ... Bi tenê wek gelek hespên wek mîhê | ☐ | ☐ |
| 12 | ... 2 kîroşk/kerguh | ☐ | ☐ |
| 13 | ... 1 kulek | ☐ | ☐ |

# KAR Û PÎŞE

Gelek zarok û mezin zemanekî di şertên pir dijwar de dixebitîn. Hindek di fabrîqeyan û hindek jî di zeviyan de rojê 12 seetan dixebitîn. Di 1842yê de, herî kêm şeş sal çûyîna zarokan a xwandingehê hat mecbûrîkirin.

Gava tu mezin bû tu dixwazî bibî çi?

..............................................................................

## Karên Şûşeyî Orranäs 2

Li Oreforê firinek ya servekirî ya germkirinê heye ku hûn dikarin şansê xwe yê pifkirina şuşeyê biceribînin. Hesinxaneyek û muzexaneyek jî heye.

## Fabrîqeya Şûşeyan a Bodayê 3

Småland zemanekî bi karên şûşeyî tije bûye, lê êdî tune ne, nemane. Karê şûşeyî Boda pêşangeheke xwe ya şûşeyan a kevnar û nûjen heye. Di fabrîqeya Zarokan de zarok dikarin pifkirina şûşeyan û rengkirina wan bi destê xwe biceribînin, di firna germkirinê ya vekirî de neqş bikin.







## Robarê Emån 4

Robarê Emån 22 milan dirêj e û di zemanên berê de rêyeka giring ya veguhestinê bû. Ji ber hindê li kenarên robarî gelek kargehên îndustriyê hebûn. Di binê robarî de geyayek ku navê wî guhmasî û xîzeka bi efsûn heye.







## 5 Papûra Bergstigenê û ocaxa kevirî

Li Degerhama Ölandê, Södra Bruketê bermayîyên balkêş ên berhemên kevn hene. Di seranserê beravê de bidin dû rêça Bergstigenê hûn ê xwe bigihînin ocaxa keviran, Albrunnayê.

## 6 Dîstîlasyona Kyrkeby-yê

Vodka bêtirî 300 salan e li vê derê tê çêkirin. Hûn ji bo nihêrtinê bi xêr hatine lê hiş ji serê we neçe!

## Kanzayên Gladhammar 7

Sifir, gewhera hesinî û kobalt li vê derê bêtirî 900 salan e tên derxistin. Kêfa gola Tjursbosjön a talûtêr bikin.

## Karên Şûşeyî Målerås 8

Hûn dikarin di Qiralîya Şûşeyî ya zarokan de şansê xwe biceribînin, ji pireyan, li ser pira di navbera elfan û trolan re derbaz bibin.








# PAPÛRÊN SIRIŞTÊ Û BIRÊVEÇÛNÊ

Jingeh û jiyana kûvî serpêhatiyên talûtêr pêşkêş dikin. Li vê derê çend deverên serdanê hene. Li gelekan papûrên bêkêmasî û cihên serşûştinê hene.

Gava jingeh bi nav bû, tu herî pir ji çi yê wê hez dikî?

..............................................................

JI VÊ DERÊ DEST PÊ BIKE.

## 1 Berrûya Kvilleken

Ev dara berrûyê hezar salî ye û cara pêşîn di 1772yan de hat binavkirin. Dora wê 13 mîtro ne û ev ji wê dike yek ji darên herî mezin ên Swêdê.

## Vippsten û gundê Hallasjö 2

Li gundê Hallasjö tu dê xaniyên wekî salên 1600 bibînî. Vippsten kevirekî 35 tonan teql e ku tu dikarî fûtan bidî çaxê tu wî dehf didî.

## Prästgropen Dröstorp 3

Dibe ku ev çala parastî şikefteke kevn a hilweşiyayî be. Li gora efsaneyê keşeyek di sedsala 17an de xwe, zîvên dêrê û cema'eta xwe di çalê de veşartiye.

## Örarevet (Şopa xijigandina kevir û xîzê) 4

Li herdu aliyên vê şopa du kilometreyan dirêj derya heye. Tu dikarî li vê derê hewayê paqij bikişînî, avjeniyeka xweş bikî, li xwezaya ciwan vehesî, goşt bipêjî û mekanê çûkan yê bêhempa bibînî.

## Sme-ån papûra siriştî 5

Papûreke delal a ku pireyên wê û deverên wê yên bêhnvedanê hene. Eger şansê we hebe dibe hûn segavekî yan dîperekî sitûsipî bibînin.

## Newala More Kastell 6

Eger hûn ji hilkişînê hez dikin, More Kastell ji we re yekbiyek e. Botên xwe yên hilkişînê bixin pê û eger hûn biwêrin newala 25 mîtroyî bipîvin.

## Parka siriştî Hornsö 7

Eger kêzik hewesa we bin, ev cihê serdanê ye. Daristana darbisitrî ya cûrbicûr mala 700 cûrê kêzikan e.

## Beijershamn 8

Ev îskeleya 2 kîlomîtro dirêj encama avakarîya sekûyeke têkçûyî ye. Îro li wê derê keleha çavdêrîya çûkan û rêyên rêveçûyînê hene. Heta vêga bêtirî 200 cûre çûkên ji hev cihê hatin tesbîtkirin.

## Rezerva siriştî Alboda Klint 9

Di rewşeke şêrîn de dîmenên talûtêr. Li golê soberîyê/avjenîyê/melevanîyê bikin, herin masîvanîyê û bêrîka kanoyê bikişînin.

## Labîrentên kevirî 10

Labîrentên kevirî yên li Gulla-skruvê nîşana awayê xebata dijwar a mirovên berê ne. Gava pêşîya rêya hesinî hat vekirin, kevir bi kindiran li alîyekî hatin raxistin.

## Girê Garpedansberget 11

Girekî ku dîmena talûtêr a 70 mîtroyî ya Gamleby-yê pêşkêş dike. Li sertarê parkek heye, li wê derê heykelên pizikan, elfan û zîyayan hene.

## Rezerva siriştî Svartbäcksmåla 12

Svartbäcksmåla devereke parastina jingehê ya ji bo bizavên servekirî ye. Gola qeşemê ya Baltik zemanekî beşeke mezin a başûrê Swêdê girtibû ber xwe. Çalên/kortalên hûn li erdê dibînin wek çalên qeşema mirî tên binavkirin.

## Tuna lövpark 13

Di vê parka bi pel a ku ew ji darên pelên xwe diweşînin pêk tê de, papûreke piçûk a birêveçûnê heye, li wê çend îstasyonên cuda hene. Li wê papûreke işqê jî heye.

## 14 Latên daleqandî Hängesten

Di seranserê rêya ji Odensvi-yê diçe Blackstadê de hindek latên daleqandî yên ecêb hene.

## Parka siriştî ya Norra Kvills 16

Yek ji 30 parkên neteweyî yên Swêdî Daristana kevnar a siriştî ya bi flora û faûnaya xwe balkêş.

## Gola Möckelmossen 15

Çemê mezintirîn ê Alvarê. Ji vê derê di ser Alvarê re çend papûr derdikevin. Li Ölandê hindek blokên hesinî yên perçeyê devera testeke veşartî ne hene.

## 18 Rêça Jonas Stolts kyrkvägî

Bidin dû rêça Jonas Stoltê goşkar ê ku berî 200 salan jiyan teswîr dikir.

## Örnberget/Fruberget 17

Örnberget û keleha kevnar a li Frubergetê dîmena talûtêr a daristanê û deryayê pêşkêş dike. Li ser rêya kelehê şikeftek heye.

## Ödet 19

Ödet, bi papûr û pireyên xwe yên peyayan fîrehîyeke siriştî ya xweş e. Keleheke çavdêrîya çûkan heye û cihek e ku lê hindek kêzikên awarte hene.

## Papûra Bielkeleden 20

Papûra Bielkeleden di seranserê hawêrdora siriştî ya heyecandêr de li dora gola Grimmansmålasjön digere. Hûn ê rêçên cotgeha ji çaxê navîn mayî ya malbata Bielke bibînin.

Hûn dikarin bêyî li kêzikekê rast bên di labîrentê re bibuhurin? Te çend rêçên pêyan çê kir?

## 21 Latê Runkesten

Giranîya vî latê mezin 260 ton e lê dê bi davdanekê bilive. Li gora efsaneyê Kâraya hût kevirî avêtiye vê derê.

## Bråbygden 22

Li derdora herêma Bråbobygdenê bigerin. Tevlî dewlemendîya tiştên pêşkêşkirinê dîmeneke kulturî yê delal.

DAWÎ

# KEVIR LI HER DERÎ NE

Hûn li ku derê binihêrin li wê derê kevir hene. Ji qeşema hundirî lat û kevirên mezin. Û dîwarên kevirî, sitargeh û kelehên mirovan ji keviran ava kirine hene. Bêyî van hemû keviran dibû ku Småland û Öland cihê xuya bibûna.

Tu dixwazî ji kevirî çi ava bikî?

........................................................................................

### Dîwarê xelek ê Kvarnholmenê 1

Kalmar yek ji wan çar qesebeyên Swêdê ye, yên dîwarên wan ji kevirên xelek in. Ji bo qesebê li dijî kiçîman/êrîşan bê parastin, di sedsala 17an de hatiye avakirin.

### Mittmuren 2

Mittmuren li başûrê Ölandê dîwareke kevirî yê 40 kîlomîtroyî ye ku rojhilet û rojava ji hev cihê dike. Bi qasî pêşbazîyeke maratonê dirêj e di pêşîya wê de çendîn parkûr dibuhurin.

### Kevirê rûnîk ê Karlevi 3

Kevirekî rûnîk ê hezar sal berê dibe ji bo şerefa şefê Danmarkî yê li wê derê hatiye veşartin hatibe çikilandin.

### Dîwarên kevirî 4

Li hemûyê Smålandê dîwarên kevirî hene. Ji bo çandina erdê divêyabû kevir bihatina derxistin. Eger hûn hemû dîwaran li dû hev daynin ew ê bi hezaran kîlometre dirêj bibin.

### Goristana kevn 5

Li Kalmarê cihê dêra gundî ya kevn. Gava qesebe di 1670yî de hat barkirin, belawela bû. Lê goristan hê li cihê xwe ye û hûn dikarin bibînin ka dêr jî çend mezin e. Hê jî gelek kêlikên kevn ên tirban hene.

### Li Brömsebroyê abîdeya aştiyê 6

Abîdeya peymana di nava Danîmarka û Swêdê de di 1645an de hatiye îmzekirin. Peyman, destpêka serweriyê Swêdê wek hêzeke mezin li dora Deryaya Baltik nîşan dida.



### Kanzaya Stenebo ya li Uknayê 7

Kanza ji sedsala 17an mayî ye û 90 mîtro nizim dibe. Hûn ji buhura 85 mîtro dirêj, dikevin eywana Mountain Kingê. Çirayekê bînin û cilên şidyayî li xwe bikin.

### Abîdeya birçîbûnê 8

Li Fagerhultê di seranserê rêya gundê kevn de ji bo mirovên di sedsala 19an de ji birçîna mirine, abîdeyek heye.

## GELEK KELEH Û SÛRÊN QESEBEYA KALMARÊ HENE

**Xerabeyên Keleha Stegeholmê 9**
Ev keleha xurtkirî di çaxa Navîn de ji bo parastina kendava Gamleby û Västervikê hatiye avakirin. Zêwa muzîkê ya salanî Visfestivalen tevlî bizavên din li vê derê tê lidarxistin.

**Keleha Borgholm 10**
Keleh bêtir ji 200 salan berê şewitiye. Egera tunebûna banê wê jî ev e. Tê gotin ku ji alî xatûna spî ve perî ye? Nizanim wateya hevokê çi ye.

**Keleha Eketorp 11**
Temenê Kelha Eketorpê digihêje sedsala 4an. Îro ev keleha yekemîn ya kevnar e ku ji nû ve hatiye avakirin. Tecrîbe bikin ka jîyana di kelehekê de çawan e.

**Gråborg 12**
Binyata sûrhên kêvnare yên herî mezin zêdetirî hezar salan berê hatiye danîn. Dîwarên sûrhê çar metreyan bilind in û dîwar tev 540 metreyan dirêj e. Misoger ev sûrhe cihê bazarê bû.

**Keleha Kalmarê 13**
Beşên herî kevn ên Keleha Kalmarê hema hema diçin hezar sal berê. Kevir ji Olandê hatine anîn. Gustav Vasa û kurên wî keleh, di sedala 16yan de ji nû ve ava kirine.

**Brömsehus 14**
Brömsehus keleheka parzatinê li sînorê danimarkî-swêdî li ber robarê Brömse bû. Niho ew xirbeyek e û tîne bîra mirovî ku Blekinge demekê ya Danîmarkayê bû.




### Girên birçîbûnê 15

Li Hägerumê dîwarên çarber yên kevirî hene. Tê gotin ku zarok û jinan ew ava kirine. Heqdestê wan jî ard û nan bû.

### Kyrkstenarna 16

Sê kevirên mezin dibin avahiyek ku tu dikarî têkeviyê. Ev cih di salên 1600î de wek dêr hatiye bikaranîn.

### Bermayîyên dêrên Kronobäckê 17

Kavilên dêreka di sedsala 15yan de hatî avakirin. Rêwî û rêwiyên keştiyan dikarîn li vê dêrê li nik şemaşeyan vehesin. Ev dêr carnan jî wek nexweşxane hatiye bikaranîn.

### Keştiya Sitranan 18


Keştiya Sitranan di 1980yî de li Storebroyê hat avakirin. Ji 20 blokên kevirî di şeklê keştîyê de hatiye avakirin. Di her blokekê de du sitranên Swêdê hene.

### Vånevik - Kara keviran 19

Berê gelek karên keviran li perava deryayê hebûn. Vånevik navenda îndustriya keviran li herêma Kalmarê bû. Niho mûzexaneyek û dirbeka rêveçûnê lê heye.

Tu dikarî çend cot çavan bibînî?

............ Cot



MA WE PÊ ZANIBÛ...
Piranîya dîwarên ji kevirê Olandê, jikevirên kilsî ne ku li ser hev hatine danîn.

# KELEK Û DERYAGERÎ

Berava Qezaya Kalmar, a herî dirêj a welêt e. Çaxê hemî veguhastin bi keştîyan dibû ew gelek giring bû. Lê di seranserê beravê de gelek sekûkelek û sekû hene. Lê vî demî de lîman û keştîgehan kêm tên bikaranîn, ji ber hêdî tişt bi rêyên bejayî yan hêsinî tên veguhestin.

Hûn herî pirr ji çi yê deryayê hez dikin?

..............................................................



## 1 Fanosa deryayê ya Långe Jan (Conê Bejndirêj)

Fanosa deryayê ya li devera herî başûr a Ölandê ye 42mîtro bilind e û fanosa deryayî ya herî bilind a Swêdê ye. Ji bo dîmenê herî ciwan yê Olandê bibînî gerek 197 derenceyan hilkişî jor.

## Li Revsuddenê sekûkeleka kevn 2

Berê kelekên mezin li vê derê hatine avakirin. Keleka paşîn Johannaya bibawan bûye, ew di 1867an de daxistine ser deryayê. Tu dikarî li girê kevirî yê li rexa coyê ku Kung Skägge têde hatiye veşarin bigerî.

## 3 Idö - Keleha zêrevaniya avê

Ji serbanê keleha kevin mirov dikare çend mîlan ji erd û deryayê bibîne. Li vê derê wênê û tiştên li ser jiyanakevin ya komgiravan hene.

## Sekûya masîvanîyê Bläsinge 4

Sekûyeke bera ya masîvanîyê ya di geyîkxaneyeke wê de muzexane heye. Eger şansê we hebe hûn dikarin di cîh de ji kelekê hinek masîyê teze bistînin.

## Qeyîqxaneya Ekenäsê 5

Kelek cara pêşîn di 1860î de li vê derê hatine çêkirin. Îro mirov li vêderê kelekên darî nû û temîr dike. Herweha li Ekenäsê firineke piçûk a nanî jî heye.

## Muzexaneya Deryagerîyê ya Bergkvarayê 6

Depoya kevn, ji keştîyên kevn wêneyan û objeyan nîşan dide. Ev der zemanekî ji bo çêkirina keştîyan û bazirganîya wan, cîhekî giring bû.

Beraz li giravê piçek diçin sergoyê rêxê.
Bi tevahî çend ajel li wê derê hene?

.......................

.......................

.......................



## Keştîya şerî; Kronan 7

Di Muzexaneya Qezaya Kalmar de bidestketîyên ji Kronanê tên pêşkêşkirin. Gava di 1676an de li beravên Ölandê noq bû, yek ji keştîyên herî mezin ên cîhanê bû. Di sala 1980yî de hat dîtin û ji wê demê pê de ji topên mezin heta pereyên zêrîn, her tişt hat xelaskirin.

## Fanosa Deryayê Garpen 8


Ji Bergkvarayê ta girava Garpen bi kelekê li dora 15 deqîqeyan diajo. Ji bo dîtina Dengê Kalmarsundê hilkişin fanosa deryayê.

## Noqa Mars Makalös 9

Hûn dikarin li Muzexaneya Västervik ji bo keştîya mezin a cengê ya li wê derê hatiye danîn a ji 1564an ve li wê derê ye bibînin û bi alîkarîya teknologîya nûjen, ber bi kûrahîya deryayê ve derkevin geştekê.

## Sekûkeleka Holms li Gamleby-yê 10

Hin ji kelekên bibawan ên herî bilez ên cîhanê di sedsala 20î de li vê derê hatin avakirin. Hindek ji wan madalyayên olîmpîyadan û Şampîyonîya Dinyayê kar kirin. Sekû bixwe ji bo bazirganîyê û veguhestinê cîhekî giring bû.


DEMA QUIZ
Şeklê rast ê li masîyê jorîn tê bixin nava giloverê.
Tu di wêneyê de çi dibînî, ku ew bi deryayê ve ve girêdayî nînbe? X dayne serê.
Ji bo tu navê gîyanewereke di deryayê de dijî bibînî, herfan tevlîhev bike. Dû re lê binihêre.
A M I S
Ji pişemasîyê re şeng û lepên bêtir xêz bikin.
Bi rêza alfabetîk ber bi gotina pêş ve herin.
JI VÊ DERÊ DEST PÊ BIKE
Lenger
Kêvjal
Kelek
Masî
marmasî
Mîdye
Qalik
Gencîne
Segav
Av
DAWÎ
Dora masiyên wek hev xêz bike.
Deh qalikên kesk ên wekhev bixin nava giloverê.
Hûn dikarin li zemîna deryayê çend zêran bibînin?
Hon dikarin di her rêzeka berjor û berjêr de ji her wêneyî tenê yekê deynin.
1 Pel:
2 Pel:
3 Pel:
4 Pel:
Li jor çar cihên ku seavî/segavî çûye serdanê hene.
Hûrgilîyên masîyî û qalikî xêz bikin.
Hûn dikarin çend masîyên piçûk bijimêrin?
St
St
St




Kalmar kommun
Mörbylånga kommun
HÖGSBY KOMMUN
Vimmerby kommun
NYBRO KOMMUN
VÄSTERVIK
Oskarshamns kommun
HULTSFREDS KOMMUN
Torsås FRÅN HAV TILL SKOG
Emmaboda kommun
KALMAR LÄNS MUSEUM
KALMAR LÄNS HEMBYGDSFÖRBUND
ÖLANDS HEMBYGDS FÖRBUND
Linnéuniversitetet Kalmar Växjö
Glasriket
DESTINATION **KALMAR**
Länsstyrelsen Kalmar län
UNIKA HISTORISKA KALMAR LÄN
EUROPEISKA UNIONEN Europeiska regionala utvecklingsfonden
Region Kalmar län

Ev weyan, perçeyekî procekta Qezaya Kalmar a Kevnar a Bêhempa ye.
Ev ji alî Los Formos ve hatiye berhemanîn. Ji bo xwandina bêtirî here vê derê: uhkl.kalmar.se

Weşana jîngeh-etîket